# Mamografî · Mammografi

## Lêkolîna pêsîran ya bê pere

## Gratis bröstundersökning




Bi xêr hatî! Em dikarin berî ku tu bi xwe bibînî kansêra pêsîran di demeke zû de kifş bikin û tu dikarî ji bo wê alîkarî bistînî. Mamografî jiyanê rizgar dike.

Välkommen! Vi kan hitta bröstcancer tidigt, innan du själv hunnit märka något och du kan då få hjälp. Mammografi räddar liv!





Pêwîst e em nasnameya we bibînin. Û hejmara we ya telefonê jî ji me re pêwîst e. Lêkolîn bê pere ye û dora 5 deqqeyan dem digre.

Vi behöver se din legitimation. Vi vill också ha ditt telefonnummer. Undersökningen är gratis och tar 5 minuter.




Em li pêsîrên te dinêrin û bi makineyekê wêneyên wan dikşînin. Ji bo ku wêneyên baş bikêşînin pêwîst e em pêsîrên te biguvêşînin. Guvaştin dora 5 saniye dem digire. Meriv hinekî pê nerehet dibe lê ne bi xeter e.

Vi tittar på dina bröst och tar bilder med en maskin. För att få bra bilder behöver vi trycka ihop bröstet. Trycket varar ca 5 sekunder. Det kan kännas lite obehagligt men det är inte farligt.



Divê tu cilên xwe yên jor derbixî. Nojdar rê te dide ka divê tu çawa bikî û makine kontrol dike da ku guvaştin bi rengekî guncav be û her wiha wêne jî baş bin. Girîng e ku tu xwe sist berdî.

Du får klä av dig på överkroppen. Sköterskan visar hur du ska göra och kontrollerar maskinen så att trycket blir lagom och bilderna blir bra. Det är bra om du kan slappna av.



Bi du re tu cilên xwe li xwe dikî. Lêkolîn bi dawî bû û dikarî biçî mal.


Sedan får du klä på dig igen. Undersökningen är klar och du kan gå hem.

För info om symbollicenser: http://www.dart-gbg.org/licenser
Detta bildstöd är skapat via www.bildstod.se i samarbete med Mammografi, Sahlgrenska universitetssjukhuset

# Mamografî · Mammografi


## Lêkolîna pêsîran ya bê pere

## Gratis bröstundersökning



Em dixwazin pirsên ji bo lêkolînê girîng in bipirsin.

Vi vill ställa några frågor som är viktiga för undersökningen.




Di derbarî pêsîrên xwe de çi endîşeyên te hene? Te di pêsîrên xwe de çi girêk kifş kirine?

Har du någon oro för dina bröst? Har du känt någon knöl?



Pêsîrên te çi caran emeliyat bûne? Te emeliyata kansêra pêsîran derbas kiriye? Te çi caran pêsîrên xwe biçûk kirine an jî pêsîrên xwe mezin/tije kirine? Ku wiha be kîjan ji wan û kîjan salê?

Har du gjort någon bröstoperation? Är du opererad för bröstcancer? Har du förminskat brösten eller lagt in implantat? I så fall på vilken sida och vilket år?



Te berê lêkolîna mamografî kirî ye? Ku wiha be li kuderê?

Har du gjort mammografi tidigare, i så fall var?




Kesekî ji malbatê ku kansêra pêsîrê pê re çêbûyî heye? Ku wiha be kî ne û çend salî ne?


Är det någon i din släkt som har haft bröstcancer? I så fall vem och i vilken ålder?

För info om symbollicenser: http://www.dart-gbg.org/licenser
Detta bildstöd är skapat via www.bildstod.se i samarbete med
Mammografi, Sahlgrenska universitetssjukhuset

# **Mamografî** · Mammografi


## Lêkolîna pêsîran ya bê pere

## Gratis bröstundersökning



Di derbarî encama lêkolînê de dê ji te re nameyek bê şandin. Dê ew name di nava çar hefteyan de ji te re were.

Du får ett brev med resultatet från undersökningen. Det kommer hem till dig inom fyra veckor.



Emê di nameyê de binivîsînin ka her tişt baş xuya dike an jî pêwîst e em çend lêkolînên din bikin.

I brevet skriver vi om allt ser bra ut, eller om vi behöver undersöka brösten mer.



Ku ji te re çi name neyên hingê ji me re telefon bike.

Om du INTE får något brev hem ska du ringa till oss.



Gelekê girîng e ku her cara ji were ji bo mamografî dem bê veqetîn hûn bên lêkolînê. Hemî jinên di salên navbera 40-70 î de ji 21 mehan carekê tên vexwandin. Careke din bê xêr bên!

Det är viktigt att du kommer till mammografin varje gång du blir kallad. Alla kvinnor mellan 40 och 74 år kallas med 21 månader emellan. Välkommen tillbaka!

För info om symbollicenser: http://www.dart-gbg.org/licenser
Detta bildstöd är skapat via www.bildstod.se i samarbete med
Mammografi, Sahlgrenska universitetssjukhuset